hejmar 27 bihar 2000

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

Civîna Cherbourgê

Civîna 27emîn ya ***Kurmancî*** di navbera rojên 14-20 gulan 2000an de li Fransa, li bajarê Şerbûrgê (Cherbourg) çêbû.

Beşdarên civînê li ser lîstikên gelerî, îdyomên kurdî, cureyên endamên laş, termên trafîkê, xwarinên Serhedê û li ser peyvên kurdî-îranî di zimanên cîran de xebitîn.

Di vê civînê de Mustafa Aydogan (Qiziltepe), Lütfî Baksi (Xerzan), Michael Chyet (Waşington), Xosro Edbullahî (Selmas), Elîşêr (Wan), Rojan Hazim (Hekarî), Hemîd Kiliçaslan (Mêrdîn), Emîn Narozî (Batman), Kendal Nezan (Diyarbekir), Selam Nûman (Qamişlo), Cemal Onursal (Cizîr), Zinar Soran (Dêrik), Behroz Şucaî (Kotol) û Reşo Zîlan (Agirî) beşdar bûn.

Encamên cîvînê di vê hejmara ***Kurmancî*** de tên belav kirin.

Têbînî : *Hevkarê me Kek Newzad Şukrî (Dihok) di civîna 26an ya Kurmancî de beşdar bûbû, lê navê wî di vê hejmarê de derneketibû. Em jê doza lêborînê dikin.*

Termên trafîkê

Amadekar: **Rojan HAZIM**


kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
trafika giştî	**genel trafik**	**trafic général**	**general traffic**
1. trafika bejahiyê*	kara trafiği	trafic terrestre	land travel, transport by land
2. trafika rêhesinî	demiryolu trafiği	trafic feroviaire	rail travel, transport by rail
3. trafika hewayî	hava trafiği	trafic aérien	air travel
4. trafika avê	su trafiği	trafic aquatique	transport by water
a. trafika deryayî	deniz trafiği	trafic maritime	sea transport
b. trafika çem û golan	akarsu ve göl trafiği	trafic fluvial	river transport

**Li hin deverên Kurdistanê ji bo bejahiyê reşahî jî têtê gotin.*


1. **trafîka bejahiyê**	kara trafiği	trafic routier	travel by road
rê	yol	route, chemin	road, way
rêwî (rêwingî, rêving, rêbiwar jî têtê gotin)	yolcu	voyageur, passeur	traveller, passenger
rêwîtî (rêwingîtî, rêvingî, rêbiwarî jî têtê gotin)	yolculuk	voyage	journey, trip
korerê	çıkmaz sokak	impasse	dead end, no outlet
rêya yekpê	tek kişilik yol	chemin muletier	narrow path
şiverê	patika	sentier	path, trail
kurterê	kısacık yol	chemin court	short way
rêya kurtebir, çolbir, rêya vebir	kestirme	raccourci	shortcut
çiqerê	ana yoldan ayrılan yol	route secondaire, embranchement	side road
kuçe	sokak	rue	street
kuçelok	daracık sokak	ruelle	lane, backstreet
kolan	geniş sokak, cadde	grande rue, avenue	large street, avenue, wide road
koberê	acil kullanım şeridi	bande d'arrêt d'urgence	emergency stop lane, hard shoulder
peyarêk	kaldırım	trottoir	pavement, sidewalk
derbasgeh	yaya geçidi	passage de piétons	pedestrian crossing
rêya sereke	ana yol	route principale	main road
navbirra rê	yol aralığı	terre-plein	traffic island
kertikên rê	yol kenarlarındaki uyarıcı şeritler	ligne d'avertis-sement routières	road shoulder marks
otorê	otoyol	autoroute	highway, motorway
çivanek	viraj	virage	curve, bend
çivaneka çepê	sola viraj	virage à gauche	curve to the left
çivaneka rastê	sağa viraj	virage à droite	curve to the right
durêyan	iki yol kavşağı	intersection de deux routes	fork in the road
sêrêyan	üçyol, üçyol kavşağı	carrefour ou intersection de trois routes	three-way intersection or T-jonction
çarrêyan	dörtyol, dörtyol kavşağı	carrefour de quatre routes	four-way intersection, crossroads
rêya bisîkletê	bisiklet yolu	piste cyclable	cycleway

Nîşana trafîka Kurdistanê ya navneteweyî

lampeyên trafîkê	trafik lambaları	feux de trafic	traffic lights
nîşan	işaret	signe	sign
nîşanên trafîkê	trafik işaretleri	signes de trafic	traffic symbols
nîşanên rê	yol işaretleri	signalisation routière	road traffic symbols
lewheyên rê	yol levhaları	panneaux routiers	road signs




nişîvê bitalûke




hevrazê bitalûke



derbasgeh


çivaneka rastê



korerê


çiqerê



çarrêyan


lampeyên trafîkê


rêya bisîklêtê


xaçerêya bêkontrol


otorê


xêzên rê, xîçên rê

Hinek ji xwarinên serhedî
-II-

Amadekar : **ELÎŞÊR**

MERGE, melzeme : *Goştê pez an ê kêrvoşkê, pîvaz û tirş.*
Dema ku goştê kêrvoşkê bê bi kar anîn, pîvaz nakin navê. Pêşî goşt tê pehtin û piştre tirş tê kelandin û dikin nav goşt.

DEM KEBAB, melzeme : *Goştê hûrkirî, badem, qeysî, nanê loş, bîbera reş.*
Goştê bi qasî serê du tiliyan hatî hûr kirin, tê pehtin. Piştre badem û qeysî tê sor kirin. Dema ku ev herdu melzemeyên han temam bûn, bîbera reş dikin ser û piştre jî bi nanê loş re tê xwarin.

'EVDÎGOR, melzeme : *Goştê hêrayî, savar, pîvaz.*
Goştê hêrayî, savar û pîvaz dikin nav hev û baş tê mizdan. Piştre ji vê melzemeyê libên mezinahiya wê bi qasî ku nava destê mirov tijî bike perçe tên çêkirin. Van liban di avê de dikelînin û piştî ku pijiya, derdixin û dixwin.

SAVARA MIRTIBKÎ, melzeme : *Savar, pîvazê hêşin, domatês û maydanoz.*
Çêkirina wê eynî wekî ya savarê ye.

BOZBAŞ, melzeme : *Goşt, pîvaz, bacanê reş, biharat û kartol.*
Ev melzemeyên han hemî bi hev re tên kelandin û piştre biharat dikin nav.
Li hinek ciyan kartol nayê bi kar anîn.

BORC, melzeme : *Goştê hestî, kelem, gizêr û pîvaz.*
Ev melzemeyên han hemî bi hev re tên kelandin.

MISEMBE, melzeme : *Goştê mirîşkan, pîvaz (gerek e zêde be), domatês, toza lîmonê.*
Pîvaz zirav zirav tê hûr kirin û di rûn de tê sor kirin. Piştre goştê mirîşkê yê hatî pehtin, domatês û toza lîmonê dikin nav û dikelînin. Misembe gerek e bi birincê re bê xwarin.

AVJAJ, melzeme : *Rûn, pîvaz, penîr, toraq û av.*
Pîvaz, penîr û toraq di nav rûn de tên kelandin. Piştre, ji bo ku zêde avî be
hinek av lê tê zêde kirin û bi nên re tê xwarin.

BINERD, melzeme: *Rûn, şîr, ar û mewîj.*
Rûn, şîr û ar (ard) dikin nav hev û piştre dikin nav tebsiyeke binê wê fireh û dipêjin. Li hinek ciyan mewîj jî dikin nav. Ev cûreyek kek e.

EGIRDEK, melzeme : *Melzemeyê wê wekî yê binerdê ye.*
Piştî ku pehtina wê temam dibe wekî devê şehriyê tê dekorasyon kirin û piştre şerbet dikin ser.

BIMBAR, DORAN, melzeme: *Rovî, goştê nerm, birinc, domatês, bîbera reş, pulbîber, maydanoz, salçe.*
Hûr rojekê berê rovî dikin nav ava xwê û hinek sirke jî dikin nav ku baş paqij be. Perçeyên biçûk ji goşt tên çêkirin û dikin nav melzemeyên ku hene. Piştre baş li hev dixin û dikin nav roviyan û dipêjin.

HÛR, melzeme : *Hûr, goştê nerm, birinc, maydanos, bîbera reş, pulbîber, salçe.*
Roşek berê tê şûştin û dikin nav ava xwê. Pişt re dikin nav ava kel û hindurê wê û çermê ser bi kêrê baş tê verûştin. Piştre jî ew melzemeyên li jorê hene dikin navê û devê wê tê dirûtin û tê pehtin.

HÛR Û ROVÎ, melzeme : *Eynî melzemeyên ku ji bo hûr û roviyê ne.*
Di şûna yek û yek bê çêkirin, hûr û rovî bi hev re tên çêkirin.

SERÛPÊ, KELLEPAÇE, melzeme : *Ser û pê, sîr.*
Ser û pê baş tên kizirandin û pirçên serî baş tên rakirin. Gelek caran jî ew pirçên serî tên kur kirin. Piştre dikin avê û ew rojekê di avê de disekine. Piştre jî dikin dîzkê û baş dikelînin.

SÊLEQELÎ, QELÎSÊL, melzeme : *Goşt, sîrmast.*
Goşt perçe perçe tê hûr kirin û bêyî av tê pehtin heta ava xwe bikêşe. Pişt re derdixin û dikin nav sêlê û sor dikin. Paşê jî dikin tebsiyan û sîrmastê dikin ser û bi nanê sêlê yan jî nanê loş re dixwin.

HÊKERÛN, QEYXANE: : Rûn tê sor kirin û hêk di ser de tên şikandin.

XINGEL: ya bi goşt, ya bi toraq û ya bi penîr.
Hevîr dikin û piştre vedikin. Hevîrê vekirî çargoşe û piçûk jê dikin. Hundirê wê bi goşt, yan jî bi toraq, penîr tijî dikin. Devê wê digirin. Wan paşê di avê de dikelînin. Bi dû re germegerm dixin tebaxan, rûn û sîrmast di ser de dikin û dixwin.

HEJÎRÊN QELANDÎ: Rûn tê sor kirin û hêjîr dikin nav û diqelînin.

XOŞAV:
Ev cureyên han yên xoşavan tên çêkirin:
Xoşava zerdeleyan (qeysiyan)
Xoşava çîrikên sêvan (çîrik: ji sêv an karçînên hişkkirî re tê gotin).
Xoşava çîrikên karçînan.
Xoşava mewîjokan (mewîjok: gêlasên hişkkirî).

Xoşava tevlihev (çîrikên sêv û karçînan û mewîjok, yan jî zerdele û mewîj bi hev re).
Xoşava bihan.
Xoşava kişmîş yan jî mewîjan (kişmîş: mewîjên bêdendik)

TIRŞÎ:
Ev cureyên han yên tirşînan tên çêkirin:
Tirşiya keleman (mixelet)
Tirşiya alesorkan (cûreyek karçîn).
Tirşiya kerengan.
Tirşiya qerpîşokan (qerpîşok: helizê nû pijkoj dayî).
Tirşiya tevlihev: (kelem, xiyar, domatêsê hêşîn, pîvaz û bîber bi hev re).

Fêkî û pêxwarinên ji bo zivistanê tên hildan:
Sêvên çalê : (cûreyek sêv e û dikin çalê û ji bo zivistanê tê hildan.

Gwîzên şarankirî: (ev jî cûreyk gwîz e û qalikê wê gelek tenik û direjî ve ne). Gwîz tên şaran kirin û bi arîkên xanî ve tên daliqandin. Dema ku dibe zivistan tînin xwarê û dixwin.

Tûyê hişkkirî: Havînan tû tên hişk kirin (piranî tûyê şîr) û qat qat datînin ser hev û dikin çapîkan û bi arîkên xanî ve dialiqînin. Ew kesên hal û wextê wan xweş be qatek tû û qatek hingivîn datînin ser hev û bi vî awayî ji bo zivistanê diparêzin.

Mastê girtî: Mast dikin denan û hinek rûnê nivişk datînin ser devan û hiltînin û dema ku zivistan tê dixwin.

Soxetan: Xwarina feqîran e. Hinek mast dikin nav dew û dikin denan û ji bo zivistanê hildidin.

Hin zexîreyên ji bo zivistanê tên hildan:
Qelî, keşk, rişte, savar, dan, penîr (penêrê bi sîrk, penîrê bi heliz û penîrê bi bitim), holiyên hişkirî, pestîla holiyan, çîrikên karçînan, çîrikên sêvan, mewîjok û hwd...

Sebzeyên ji bo zivistanê tên hildan:
baqle, lobî, bacanên reş, domates, kulindir, kelem, kartol û hwd.

Pincarên ji bo zivistanê tên hildan:
Xaxêz, karî çirêş cantirî, spîtak, gûlik, mendê û hwd.

Hin cureyên endamên laş û îdyomên jêçêkirî

Amadekar : **Reşo ZÎLAN**

PÊ	**AYAK**	**PIED**	**FOOT**
pêpan	düztaban	qui a des pieds plats	flat footed
pêxwar	yamuk ayaklı	qui a des pieds tordus	flat footed
pêtapan, pêhirç	iri ve geniş ayaklı	qui a des pieds trop larges, déformés	having very wide or deformed feet
pêqerase, qalibbetal, pêtikpan	kocaman ayaklı aşırı ölçüde büyüle olan	qui a des pieds trop grands, hors normes	having exessively big or outsized feet
pêşûnik	uzun ayaklı	qui a des pieds longs	having long feet
pêvajî, pêvaç	çarpık ayaklı	qui a des pieds torses	having twisted feet
pêqut, pêgirê	küt ayaklı	qui a des pieds courts et forts	having short, strong, feet
îdyom			
pêsivik	ayağına çabuk	qui a le pied léger, rapide	having light or rapid steps
pêstûr	zorba, zalim	despote, oppresseur	despot, oppressor
pêstûrî kirin	zorbalık etmek, zülüm etmek	opprimer, brutaliser	to oppress or mistreat
pêxwas	serseri, lümpen	va-nu-pieds, voyou	tramp, lout or hooligan
pêgiran	1) ayağına ağır, 2) gebe, hamile	1) qui a le pied lourd, lent ; 2) enceinte	1) having heavy or slow steps 2) pregnant
pêkolî, pîkolî	1) eşeleme, 2) sabırszlanma, 3) azma, kurcalama	1) piaffage ; 2) le fait de piaffer	1) impatientce 2) to champ at the bit
		d'impatience ; 3) action de fouiner	(for animals: to paw the ground)
pêstûrk	kesilme, tıkanma (insan için)	essoufflement	out of breath
pêgermok, pêgermî	volta	les cent pas, promenade	a walle, a stroll
pêgermokê gerandin, pê germ kirin	volta atmak	faire les cents pas	to pace up and down
POR, PIRÇ, MÛ	**SAÇ**	**CHEVEU**	**HAIR**
porgij(ik), porgijgijî	dik ve kabarık saçlı	qui a des cheveux rebelles et emmélés	who has rebellious, tousled hair
porxelek	halkalı saçlı	qui a des cheveux en forme d'anneaux	who has ringlets
porkurîşk, porxingil, porxingilok	kıvırcık saçlı	qui a des cheveux frisés	who has curly, or frizzy, hair, frizzy-haired
porlûle, porbadayî	bukle saçlı, lüle saçlı	qui a des cheveux bouclés	who has curly hair, curly-haired
porjûjî	kirpi saçlı	qui a des cheveux dressés (comme un hérisson)	who has hair standing on end (like a hedgehog)
porhenne	kınalı saç		black-haired
porbizin	kıl saçlı, saçı form almayan	qui a des cheveux difficile à coiffer	who has hair that's hard to keep tidy
porkulav, porgûnî, porgivîşk	keçe saçlı	qui a des cheveux emmêlés et durcis	who has hair that's tangled and stiff
		par la saleté comme du feutre	and matted with dirt
porreş	siyah saçlı, kara saçlı		
porbelavî	dağınık saçlı	qui a des cheveux éparpillés, aux quatre vents	who has dishevelled hair
porzer, porzerînî	sarı saçlı	qui a des cheveux blonds	blond-haired
porbijî	yele saçlı	qui a des cheveux drus et longs comme une crinière	who has longs, straight hair like a mane
pirçhirç	ayı gibi fazla tüylü (vucut için)	vélu comme un ours	hairy as a bear
porsîs	akşın, albino	albino	albino
porşayik, porşahîk, pirçhilû, porhilû	düz parlak saçlı	qui a des cheveux lisses et brillants	who has smooth, shiny hair
porgurr	gür saçlı	qui a des cheveux drus et fournis	who has thick, long hair like a mane
porfirk	seyrek saçlı	qui a des cheveux clairsemés	who has thin hair
porzêr, porzêrînî	sırma saçlı	qui a des cheveux d'or	who has golden hair, golden-haired
porsor	kızıl saçlı	qui a des cheveux roux	who has red hair, red-haired
porspî	ak saçlı	qui a des cheveux blancs	who has white hair, white-haired
porkurt	kısa saçlı	qui a des cheveux courts	who has short hair
pordirêj	uzun saçlı	qui a des cheveux longs	who has long hair
porweşiyayî	saçı dökülmüş	qui a perdu ses cheveux, chauve	to be bald

porberdayî	örülmemiş saç	qui a des cheveux non tressés	who has disheveled hair
porspî	yaşlı, ak saçlı, deneyim sahibi	vieux, vieille, femme expérimentée qui conseille la jeune mariée	an experienced older woman who advises a bride
pordirêj	kadın		long-haired, woman
POZ, difin, bêvil*	**BURUN**	**NEZ**	**NOSE**
pozkerimî, bêvilkerimî, pozkermitî	çicek hastalığından dolayı burnu yara izleri taşıyan	qui porte au nez des cicatrices de la variole	who has a pock-marked nose
pozkurmî	marazlı burun	qui a le nez infecté	who has an infected nose
pozkov, bêvilkov	kısa ve burun delikeri gözüken kalkık burun	qui a le nez court et rectroussé dont les narines sont en vue	who has a short snub nose with blaring nostrils
pozbilind, difinbilind, kepîbilind, dinfinberz, bêvilbilind	burnu havada, mağrur, kibirli	hautain, arrogant	haughty, arrogant

* Têbînî : çend cureyên pozan berê di hejmara 18an ya Kurmancî de derketine.

Îdyomên kurdî

Amadekar : **Hemîd KILIÇASLAN**
Mustafa AYDOGAN

kurdî	turkî	fransizî	îngilîzî
ji yekî pelikandin (ez ji te dipelikînim)	birinden çekinmek	craindre quelqu'un	to feel challenged by someone; to have something to fear from someone
ji dupelikiya wî de nas kirin> ez wî ji dupelkiya wî de nas dikim	birini çocukluğundan beri tanımak	connaître qn depuis son enfance (ses premiers pas)	to have known someone since child-hood, to know someone's background
ji tilîya xwe bêhn kirin > ma min ji tilîya xwe bêhn kiribû; ji xeybê zanîn	nerden bilebilirdim ki	comment aurais-je pu le savoir? aurais-je flairé de mon doigt? (lire dans une boule de cristal?)	how was I supposed to know? (lit. in a crystal ball?)
ji tira xwe re dibêje wêde; ji qûna xwe re dibêje wêde	kendini çok beğenmiş, kıçına çekil ordan seni tanımıyorum diyen	très imbu de lui-même (litt. qui ne reconnait pas ses pets et veut les cacher)	said of conceited people: he tells his own farts 'Get away from me', i.e., he ignores or denies his past faults
ji yekî / tiştekî piştkul bûn	bir dosta veya bir şeye bel bağlayamamak, beli bükük olmak	on ne peut pas être sûr de qn à cause de ses fautes passées	to lack confidence in someone because, because of past faults, to have given up on others, not to be able to depend any more on someone
kaya şil firotin; giyayê xwe ter dan	ne suç işlediğinin farkında olmak	(litt. vendre de la paille mouillée) être conscient d'avoir commus une mauvaise action	(quiet and nervous) because one has committed an offense and is aware of it
kerek ji ber 'aciz e; kîrê wî naçe gorakê; kîrê wî naçe ferek gore	eşek kadar büyük olmak, büyük olmasına rağmen çocukça davrananlar için söylenir	il est grand comme un âne ou sa verge ne tient pas dans une chaussette tellement il est grand mais il agit comme un enfant	he is a grown man, but is still behaving like (or doing the work of) a boy
kerrên wan li korên wan gerandin(/hesilandin)	perişan etmek, darmadağın etmek	provoquer la déroute de ses ennemis (litt. faire de sorte que leurs sourds cherchent l'onde de leurs aveugles)	to rout his enemies (lit. to make their deaf dependent on their blind)
kes nizane, ka bezê guhê bavê wî ji kû ye	soyu sopu belli olmayan	nul ne sait de qui il descend, nul ne connait son pedigrée	no one knows what his descent or pedigree is (i.e., whether or not he is a bastard)
ketin pêxîla yekî; ketin pêsîra yekî; ketin ber sîngê hev; bi difna yekî ve man	biribirine düşmek	s'en prendre à qn, se quereller avec qn	to pick a quarrel, get into a fight or argument
ketin qirika yekî; ketin gewriya hev	boğazlaşmak	s'empoigner	to try to get at someone's throat, to come to blows
ketin ber destan	yardıma ve bakıma muhtaç bir duruma düşmek	sombrer dans la dépendance, avoir besoin de l'aide et des soins d'autrui	to be unable to care for oneself any more, to be in need of someone else's help
ketin ber lingan; ketin ber pêyan	ayağa düşmek	(litt. tomber sous les pieds) ne pas pouvoir se mouvoir par soi-même, être dépendant	to become needy (in a humiliating manner)
kevanê wî kerik e.	sorun yaratmayan, uyumlu	(litt. son arc est silencieux) il est souple; il ne fait pas d'histoire, il s'adapte aisément	he doesn't make waves; he doesn't rock the boat; he doesn't complain, argue, or make trouble (literally 'His bow is quiet')
kewê xwe di mijê de bernedan	iyice düşünüp taşınmadan bir şeye girişmemek	(litt. ne pas lâcher sa perdrix dans le brouillard) ne pas entreprendre une action sans mûre réflexion	to look before you leap (literally 'not to let one's partridges loose in the fog')
keviran diavêje gûyê xwe; bi keviran dide gûyê xwe	budalaca davranan	il agit stupidement (litt. il lance des cailloux contre ses execréments).	said of fools : He shoots himself in the foot (literally 'he throws stones at his own dung')
kevirek danîn ser; ne hilîne ne deyne	meseleyi kapatmak	stopper net une discussion, éviter de parler de qch (litt. poser des pierres dessus)	to end the discussion, to forget the whole thing
kezeba yekî anîn xwarê; kezeb di dev re derxistin	birini çileden çıkarma	exaspèrer qn, excéder qn par des actes ou propos contrariants. (litt. faire dégurgiter le foie de qn)	to make someone ill (with one's annoying actions), to drive someone up the wall
kezebker; kezebhilûk	yavrusuna çok düşkün	aux petits soins avec ses petits, qui couve et gâte ses enfants	doting on one's children, spoiling one's children
kezeba xwe dan ber bê (bayê bêrîn)	yüreği soğumak	se sentir soulagé après des troubles ou ennuis (litt. exposer son foie au vent)	to take one's frustrations out on someone (by soundly beating someone up)
kezeba xwe hênik kirin	yüreği rahatlamak	avoir le coeur soulagé (litt. rafraîchir son foie)	to feel relieved
kezeb qetandin	ölesiye korkmak	avoir une peur bleue (litt. rompre le foie)	to be scared to death
kezeba wî bez girtiye	soğuğa meydan okuyan	il défie le froid (litt. son foie est engraissé)	he can stand the cold; He is not afraid of the cold
kezebreşî kirin	kahırdan verem etmek, hasta etmek	rendre qn malade, exaspérer qn, (litt. noircir le foie de qn)	to make someone sick or furious, to annoy or disgust someone
kezeb şewitîn	ciğeri yanmak	avoir beaucoup de peine (litt. avoir le foie qui brûle)	to feel bad or sorry (for someone)
kirasê wê li wê ye; dawa wê li ser wê ye	aybı örtülü	sa faute est couverte, dissimulée	his fault is covered up
kirasekî lê bike	bir kılıf bul	trouve-lui un habillage, une justification (litt. une robe)	to dress it up, find a justification
kirasekî lê bibire	ona bir değer biç	donne-lui un prix, fixe une valeur (litt. découpe-lui une robe)	set him a price (lit. cut him a suit)
kirasan dibire	sürekli sorun yaratan	il crée constamment des problèmes (litt. il découpe des robes)	he's always causing problems (lit. he's cutting a suit)
kirasê nedirûtî lê kirin; kirasê nedirûtî xistin stû: buhtan		calomnier qqn, (litt. habiller qqn d'une tunique non cousue)	slander someone (lit. an unsewn suit)
kirê devan li qûna pisîkan rast kirin	biribirine hiç uymayan şeyleri uydurmaya çalışmak	vouloir combiner ou accorder des choses incompatibles (litt. faire assumer aux chats les actes des chameaux)	wanting to do incompatible things (lit. make cats act like camels)
kîrekî herrînî jê re çêkirin	yumurtaya kulp takmak	(litt. affubler qn d'une verge en boue); gaspiller son énergie à faire des choses impossibles et innefficaces	to waste effort on doing the impossible (lit. beating someone with a rod of mud)

kodika vala li ya tije xistin	kaybedecek şeyi olmamak	(litt. frapper le bol vide contre le bol plein) n'avoir rien à perdre à tenter sa chance	having nothing to lose by trying
kokana berxê, li ber qula gur kutan	kuzuyu kurda teslim etmek	jeter l'agneau dans la gueule du loup	throwing the lamb to the wolves
korfeleqî lê rast hatin; ji korfeleqî ve lê rast hatin.	tesadüfen rastgelmek	rencontrer qn par hasard, fortuitement	meeting someone by chance
korfeleqî = darteleqî = qûnfeleqî = topteleqî :	rastgele, tesadüf	par hasard, fortuitement	by chance, accidentally
kuçe li xwe badan	sıvışmak, izini kaybettirmek	déguerpir, faire perdre sa trace	to leave, to vanish
kûçik nema nên ji destan digire	rezil rüsva olmak	être couvert de honte (au point que même un chien refuse de prendre du pain de ses mains)	to be covered in shame (lit. even a dog won't accept bread from him)
kul bişkivandin	yarasını deşmek, derdini deşmek	remuer ses plaies	re-open ones wounds
kulzik = zikreş	kinli, kini olan	haineux, rancunier (litt. qui a le ventre noir)	resentful, to hold a grudge (lit. to have a black stomach)
kumê Elo li serê Welo kirin; kumê Elo li serê Celo kirin	Ali'nin külahını Veli'ye, Veli'nin külahını Ali'ye giydirmek	habile, qui mène ses affaires en se jouant des uns et des autres	cunning, someone who plays people off against one another
kum li serî fireh bûn; serî lê mezin bûn	koltukları kabarmak	avoir la grosse tête (litt. avoir le bonnet qui enfle)	to be big headed (lit. to have a big hat)
kum li serî fireh kirin	koltuk vermek, pohpohlamak	flatter, flagorner qn (faire enfler le bonnet de qn	to flatter
konê wî ji nav waran rakirin; ji nav rakirin	mahvetmek, ocağına incir ekmek	anéantir, détruire qn (litt. faire disparaître sa tente)	anihilate, destroy someone (lit. make their tent disappear)
keda wî bi avê de çû; kada wî bi erdê de teqiya	emeği boşa gitmek	son travail a été vain, son oeuvre est allée à vau-l'eau	all his toil (or labor) was in vain, or was wasted
kepîyê (/pozê) xwe badan	burun kıvırmak	rejeter avec dédain, dédaigner	to contemptuously turn down or reject an offer
kumê (/şaşika) xwe danîn ber xwe	külahını önüne koyup düşünmek	(litt. poser son bonnet devant soi) réfléchir longuement pour prendre une décision	to think things through to reach a decision (lit. place one's hat before one)
kumikê bênamûsiyê dan serê xwe; cilika bênamûsiyê kişandiye serê xwe; kirasê bênamûsiyê kiriye ber xwe	her türlü namusuzluğu kabullenmek	se résigner à l'infâmie, à linsustice, l'affront sans réagir (litt. se couvrir la tête du bonnet de déshonneur)	to accept scandalous behavior (or being mistreated or dishonored) without resisting; to close one's eyes and pretend not to see injustice)
kepî êxistin her derî de; pozê xwe xistin her derê	burnunu her deliğe sokmak	mettre son nez partout, se mêler de tout	to stick one's nose into everything; to be meddlesome

Lîstikên gelerî

Amadekar : **Selam NÛMAN**

Birr, lîstika girrê, topşeq : beşdarên lîstikê dibin du ber (birr) : A û B. Her birrek bi hindikî ji 3 kesan pêk tê. Birra Ayê li dora komikê (kêlê, hoçikê, tilhoçikê, qomkê) belav dibin. Birra Ayê ji aliyekî ve komikê diparêze ji bo kes ji birra Byê li çirra (birra) wan nexe û ji aliyekê din jî endamên birra Byê bigirin, yên tên girtin dişewitin û ji lîstikê derdikevin.

Mirovên Ayê di van halan de dişewitin :

1- Ger yek ji Byê li navbera yekî Ayê û qomikê bixe, ew mirovê Ayê dişewite ;
2- Ger yek ji Byê li navbera du kesên Ayê bixe, herdu kesên Ayê bi hev re dişewitin ;
3- Ger yek ji Byê di navbera qomikê û çend kesên Ayê re derbas bibe, ew kesên Ayê hemû dişewitin ;
4- Ger yek ji Byê lingê xwe deyne ser qomikê, wê gavê hemû kesên Ayê dişewitin. (Ji vî halî re dibêjin çirra qomikê yan kêl kirin).

Mirovên Byê jî bi vî awayî dişewitin :
Ger yek ji Ayê destê xwe li yekî Byê bide, ew kesê Byê dişewite.

ji birra kesên ku kelê (qomikê) diparêzin re dibêjin yên ber deriyan.

serbirr : serekê birrê, serekbirr

şilmeziwa, (*tir.*) yazıtura, (*fra.*) pile ou face, (*îng.*) heads or tails
qomik : kêl, hoçik, tilkoçik, komik (*tir.*) korunacak kaleyi temsill eden dikili taş ya da elbise künmesi (*fra.*) grosse pierre ou amas de vêtement qui fait office de forteresse à défendre (*îng.*) pile of stones or clothes acting as goals

Çavgirtînk : veşartok, çavberdik, çavveşartik, çavnigan, çavgirtinok
(*tir.*) saklambaç, (*fra.*) cache cache, (*îng.*) hide and seek

Yek ji lîstikvanan çavên xwe digre (pîrik) û yên din xwe vedişêrin. Kesê ku çavên xwe digire, heta dehan dihejmêre û bi dû re çavên xwe vedike û dibêje "ez hatim" li hin derên din dibêjin "berdok, şîr û şemamok".
- yê ku ji aliyê kesê ku dêya wî ye, tê dîtin dişewite û ew dibe pîrik.
- lîstikvanê ku berî pîrikê xwe bigihîne niqê xwe xelas dike (naşewite).

Pîrik : (*tir.*) ebe, (*fra.*)............. , (*îng.*) "it" in cildren's games

Çavşûtenek : Awayek veşartokê ye piranî di şevên tavehîvê de dileyizin.
Lîstikvan dibin du birr. Birrek ji wan li ber şûtê (xêzek an nîşanek e li ser dîwar, dar an zinarekî) dimînin, çavên xwe digirin. Piştî ku çavên xwe vedikin, yek ji wan li ber şûtê dimîne û şûtê diparêze jê re şûtvan dibêjin û yên din diçin li lîstikvanên birra din ku xwe veşartin digerin. Divê ku yek ji wan yên veşartî, yek bi tenê jî bê û destê xwe li şûtê bide, birra ku li ber şûtê bû der dide (winda dike).

Nikilkê : hindilkê. Cihê lîstikê tê xêz kirin, ev cih çargoşe ye, qasî saha voleybolê ye. Lîstikvan dibin du birr. Yek ji birra Ayê, bi nikilkê (bi lingekî) pey hemû kesên birra Byê dikeve û hewl dide wan bigire. Ger lingê wî lîstikvanî gihişt erdê ewê bişewite û derkeve. Bi vî awayî hemû kesên birra Ayê yek bi yek dekevin saha lîstikê. Dive hemû kesên birra Byê bêne girtin ji bo ku birra Ayê serkeve an na ewê lîstik ji nû ve bê lîstin.

Xeta : Kulîkulî, ferşane, banê xanî, kîpî, çolanê, çixêzê, teytork
(*tir.*) çizgi oyunu, (*fra.*) marelle ?, (*îng.*) hopscatch

Hingilyo : turane, tûr (V. Explication)

Qaç : çors, tefs (v. Explication)
(*tir.*) elaysı genişliğinde yassı taş ve bu taşla oynanan oyun
(*fra.*) galet de la grosseur de la paume et une variante de pétanque avec lequel on joue, (*îng.*) pebble the size of one's palm or a variety of bowls

Qehfik : qafik
(*tir.*) kırılmış çömlek parçaları ve onlarla oynanan bir oyun
(*fra.*) tesson de poterie et le jeu avec lequel on joue
(*îng.*) shard of pottery or a game

Sêgav : lîstikvan ji xêzeke diyar ve sê gavên li pey hev diavêjin, yê ku dûrtir here qazanc dike.

Xweçengkirin : xweavêtin, xwehilavêtin, (*tir.*) atlama, (*fra.*) bond, saut, (*îng.*) jump

Cotkanî : xwe çengkirina bi her du lingan
(*tir.*) iki ayağı bir araya getirerek sıçrama, (*fra.*) saut fait en piquant les deux pieds
(*îng.*) a hop or jump on both Feet at one

Kevirê qewetê, kuçê quwetê
(*tir.*) güç denemesi için atılan ağır taş, en uzağa atan kazanır
(*fra.*) grosse pierre que les concurrents essaient de lancer aussi loin que possible ; sorte de lancer de disque.
(*îng.*) large stone that contestants try to throw as far as possible, as in discus throwing

Kevirê cerabê : kevirê giran ê ku ji bo cêribandina qeweta xwe hiltînin.
(*tir.*) güç denemesi için kaldırılan ağır taş
(*fra.*) pierre lourde que les concurrents soulèvent à tour de rôle pour prouver leur force, sorte de haltère primitive.
(*îng.*) heavy stone that contestants try to lift - primitive weight lifting

Kevirane : dûravêtina kevirên ji destekî hûrtir ; yê ku dûrtir diavêje bi ser dikeve
(*tir.*) uzağa taş atma ; en uzağa atan kazanır
(*fra.*) lancer de cailloux ; celui que lance au plus loin gagne le jeu.
(*îng.*) throwing pebbles - game is won by whoever throws furthest

Çomerkê xeramerkê, gundogundo xerabe : Ev lîstik di hêvrohnê (tavehîv, taveheyv, hîveron) de tê lîstin. Du birr dilîzin. Birra Ayê di cihên talde û axpînk de bi tiliyên xwe xetan dikişîne. Piştî wê birra Byê li wan xetan digere û xerab dike. Çiqas xet mabin weqe qal li birra Byê dimîne. Dûre birra Byê û Ayê cîh diguherin.

Sêqûçê, sêqûç kê : Du birr dilîzin. Bi kevirekî girover/çorsekî ew qûç tên xerab kirin. Piştî wê, birra A û Byê cîh diguherin.

Kêlanê, kêlvêlok, kêlê : Du birr dilîzin. Her birr 3 kêlan datîne. Navbera her kêlekê bi qasî gavekê ye. Birra Ayê yek bi yek kevirekî qasî lepekî diavêje kêlên birra Byê. Eger ew kes kêlekê bixîne, heqê wê heye ku kevirekî din biavêje. Heke du kêl xistin, heqê wî heye ku sê keviran biavêje. Heke birra Ayê hersê kevirên birra Byê nexîne, hingê dibe dora birra Byê ku biavêje. Kîjan birr hersê kevirên birra din bixîne bi ser dikeve. Cezayê birra ku lîstik wenda kiriye ew e, divê kesên birra biserketî li pişta xwe siwar bikin û tibabekê bigerînin (li hin deran cilên wan ji wan dikin).

Gog, goganê : Du birr dilîzin. Birra Ayê, ji niqteyekî, bi darekî li gogê dixe. Heger birra Byê gogê li hewayê bigire ewê birra Ayê bişewite û bibe dora birra Byê ku li gogê bixe. Heger gog neyê girtin, ew kesê ku li gogê xistiye dê here niqteyeke din ku bi qasî 20 gavan dûrî niqteya pêşîn e û vegere cihê xwe yê berê. Ger bira Byê gog avêt û li lîstikvanê birra Ayê xist ewê birr cihên hevûdu biguherin.

Peyvên kurdî-îranî di zimanên cîran de

- II - DI TIRKÎ DE

Amadekar : **Reşo ZÎLAN**
Behroz ŞUCAÎ

Ç

çabuk : çapûk, çepûk, *far.* : çabuk, *peh.* : çapuk	vite, rapide, rapidement, agile	quick, fast, swift, agile
çadır : çadir,çandir; çator (çadirên kevn), *far.*: çadur, *peh.*: çatur, *sans.*: çatra	tente	tent
çakal : çeqel, *far.*: çeẍal, şeẍal, şegal, *peh.*: şegal	chacal	jackal
çakı : çaqû, çeqû, *far.*: çaqû	canif	pocket knife, clasp knife
çalak : çalak, *far.*: çalak	agile, rapide, prompt	agile, swift
çanak : çanax, *far.*: cunaẍ	pot de terre	earthenware pot
çanta : çente, *far.*: çente	sac	bag
çapraz : çeprast, çepras, *far.*: çepras, çeprast	croisé, transversal, de biais	crosswise, transversal
çardak : çardax, çartaq, *far.*: çartaq, çehartaq	treillis, tonnelle	trellis, bower
çare : çare, *far.*: çare, *peh.*: çarek, çar	remède, moyen	remedy, cure, way, means
çargah : çargah, *far.*: çargah	un makam ou mode musical	a simple makam or oriental-music mode
çarık : çarix, çarox, *far.*: çaruẍ, çaruq	sandale en cuir brut	rawhide sandal
çark : çerx, *far.*: çerx, *sans.*: çakra	roue	wheel
çarmıh : çarmîx, çarmix	crucifix, croix	cross on which criminals were nailed
çarnaçar : çarneçar	bon gré mal gré, volens nolens	willy-nilly, whether one likes it or not
çarşaf : çarşev, *far.*: çadurşeb	1) drap de lit, 2) tchador	1) bed sheet, 2) chador
çarşamba : çarşem, çarşemb, çarşembî, *far.*: çarşenbe	mercredi	Wednesday
çarşı : çarsû, çarşî, *far.*: çarsû, çaharsû	bazar, centre-ville, commerçant, souk	shopping district, market quarter
çavdar : çewdar, çawdar, çewder, *far.*: çavdar, *lat.*: secale cereale	seigle	rye
çayhane : çayxane (çay ji zimanê çînî), *far.*: çayxane	salon de thé	tea house
çehre : çehre, çihre, rû, *far.*: çihre, *part.*: çihreg	visage, aspect, apparence, face	face, aspect, appearance
çek : çek (yên bankeyê, pere), *far.*: çek	chèque	check
çekiç : çakûç, çekûç, çakîç, *far.*: çekuş, *peh.*: çekuç	marteau	hammer
çelenk : çeleng (gul), tacegul, *far.*: çeleng	couronne (de fleurs), guirlande	wreath, garland
çelik (çelik çomak) : çiling, *far.*: çiling	bâtonnet	tipcat
çeltik : çeltûk, çiltûk, *far.*: şeltûk, çeltûk	riz non décortiqué	rice in the husk
çember : çember, *far.*: çenber, *peh.*: çember	cerceau, cercle	hoop, flat ring of wood or iron, cercle
çene : çen, çene, çenge, çeng, erçen, erzen, erzing, *far.*: çane	menton, mâchoire	chin, jaw
çengi : çengjen, çengî, *far.*: çengî	danseuse publique	public dancing girl
çengel/çangal : çengel, çengal, çingal, *far.*: çengal	crochet	hook
çenk : çeng (alaveke mûzîkê) *far.*: çeng, *peh.*: çeng	lyre orientale	oriental lyra
çenk : çeng, *far.*: çeng	croc d'un oiseau de proie	claw of a bird of prey
çepel : çepel, *far.*: çepel	sale, saleté	dirty, dirt, filthy, muddy
çeper : çeper, *far.*: çeper	balustrade, haie	fence, wall
çerçeve : çarçove, çerçeve, *far.*: çarçûbe	cadre, encadrement d'une fenêtre	frame, window frame
çerçi : çerçî, *far.*: çerçî	camelot, marchand ambulant	peddler
çeşme : çavî, çehvîk, çeşme, *far.*: çeşme, *peh.*: çeşmeg	fontaine, source d'eau	fountain, spring of water
çeşni : çêj (tehm/tam), *far.*: çaşnî, *peh.*: çaşnîk	goût, saveur	taste, flavor
çevgen : çogan, çov (çûv), ço, çem, *far.*: çowgan, *peh.*: çopigan	club de polo	polo stick
çevik : çapûk, çepûk, sivik, *far.*: çabuk, *peh.*: çapûk	agile, vif, leste	swift, nimble, agile
çeyrek : çarîk, çaryek, çarêk, *far.*: çarek	quart	quarter, one fourth
çınar : çinar, *far.*: çinar, *peh.*: çinar	platane	plane-tree
çıra : çira, *far.*: çiraẍ, *part.*: çiraẍ	lampe, lampion	oil lamp, lamp
çırak : çirax, *far.*: çiraẍ, *part.*: çiraẍ	apprenti, novice	apprentice, novice
çıkrık : çirik, çixrix, çerx, *far.*: çerx-i ça, *sans.*: cakra	trevil	spinning wheel, pulley
çırpı : çirpî, çilpî	brindilles, broussailles	dry twigs, chip, clipping
çırpmak : çirpîn/çirpandin	secouer, claquer, épousseter	to beat with short, repeated blows
çiçek : çîçek, *far.*: çîçek, çeçek, *sans.*: çeçeke	fleur	flower
çift : cot, coht, *far.*: cuft, *peh.*: cog	couple, pair, double	couple, pair, double
çifte : çifte	doublet, paire, double	paired, double
çil : çîl (spî), *far.*: çîl (ji bo hespê dest û pê spî)	moucheté, tacheté	freckle, speckle, freckled
çilav : çilaw, *far.*: çîlav, çîlev	plat de riz bouilli	dish of boiled rice
çile : çîle (ji çileya derwêşan), *far.*: çille	épreuve, souffrance, peine	ordeal, trial, suffering
çile : peng, gulîfk, gacik, gac, kelef, çîle, *far.*: culle	écheveau	hank, skein
çilekeş : çilekêş, *far.*: çillekeş	qui endure une peine, une épreuve	endurer, sufferer
çilingir : çilingêr, *far.*: çilinger, çilînger, çîlanger, *peh.*: çîlenker	serrurier	locksmith
çimen : çîmen, *far.*: çemen	gazon, pelouse	garden grass, lawn
çingene : cingene, cengene (= poşe, qereçî), *far.*: çengîyan	gitan	gypsy
çini : çinî, çînî (ji ber ku ji Çînê hatiye), *far.*: çînî (amanên spî)	porcelaine	porcelain, china
çir : çîr, çîrik (ji bo hin mêweyên hişkkirî)	fruits séchés (abricot, prune, poire, etc.)	dried apricot, prunes
çirkef : çirkav, çîrkef, *far.*: çirkab	1) cloaque, 2) individu dégûtant	1) foul water, sewer, 2) disgusting fellow
çirkin : çirkîn (kirêt), çîrk *far.*: çirkîn, *peh.*: çirkên	1) laid, 2) infâme, odieux	1) ugly, 2) shameful, disgusting
çivit : çivîd, çivît, civît, çiwît	indigo	indigo, washing blue
çıvidi : çivîdî, çivîtî	bleu indigo	indigo blue
çoban : şivan, *far.*: şeban, çûpan, *peh.*: şuban	berger, bouvier, vacher	shepherd, herdsman, cowboy
çor : çor, erdê çor, *far.*: şûre	aride	arid, barren
çorak : çorax, *far.*: şûre, şûrezar	terre aride	arid or barren soil
çorap : gore, *far.*: cûrab, gorab	chaussette	stocking, sock
çorba : şorbe, şûrbe, *far.*: şûrba	soupe	soup
çöl : çol, çolistan, *far.*: çûl	désert	desert, waste land
çömçe : çemçe, çemçik, çoçik	louche	ladle
çöp : çov, ço, çop, *far.*: çûb, *peh.*: çob	fétu, balayure, ordure	chip, stalk, peduncle, garbage
çubuk : çopik, şiv, şivik, *far.*: çûbek	rameau, barre, verge	rod, bar, wand, staff
çuha : çoxe, coxe, çûxe, çox, çux, *far.*: çûxe, çûxa	drap grossier	broadchoth
çuval : çewal, çiwal,çiwan, cuhal, cuwal, çiyal, çal, *far.*: çuwal, *peh.*: gewal, cuwal	sac, gros sac	sack

çük : çûk (= bilik, bilo, lûlik), *far*.: çûk	zizi	willy, penis
çünkü : çunkî, çunkû, çimkî, çimakî, çimku, çunke, çiko, çikû, *far*.: çunkî	parceque	because, for
çürük : çurûk, çirûk (rizî), *far*.: çurûk	pourri, gâté, putride, moisi, rance	rotten, putrid, unsound

D

dem : dem (zeman), dem (ya çay û xwarinê), *far*.: dem	1) moment, instant, temps, 2) infusion	1) moment, time, instant, 2) infusion
dadı : dadik, dadûk, dayîn, daşîr, *far*.: dade	nourrice	child's nurse
dağ : dax, *far*.: 1. daẍ (kel), *peh*.: 1. dak 2. daẍ	marque au fer chaud, blessure	brand made with a hot iron, cautery
damar : tamar, damar, *sans*.: tamar	veine	vein, blood-vessel
danışmak : tanişîn (daniştin) *far*.: danisten	consulter, demander avis	to consult (about)
dayı : dayî, *far*.: daî	oncle maternel	maternal uncle
değme : degme, (degmen, be degmen bi soranî)	n'improte qui, personne	every, any
dehliz : dehlîz, *far*.: dehlîz, *peh*.: dehlîz	vestibule, corridor	entrance-hall, corridor
derbeder : derbider, derbeder, *far*.: derbeder	vagabond, clochard	vagrant, tramp
derbent : derbend, *far*.: derbend	passe de montagne, défilé	mountain-pass, défile
derdest : derdest, *far*.: derdest	mettre la main dessus, arrêter, saisir	to arrest, to seize
dergah : dergeh, *far*.: dergeh, dergah, *peh*.: dergah	1) court d'un roi, 2) couvent, ermitage	1) court of a king, 2) covent
derkenar : derkenar, *far*.: derkenar	note marginale, post-scriptum	marginal note, post-script
derman : derman, *far*.: derman, derman	remède, médicament	remedy, medicine
dert : derd, *far*.: derd, *peh*.: derd, *part*.: derd	peine, chagrin, souci, souffrance, maladie	pain, suffering, sorrow, illness
derunî : derûnî, hindurî, *far*.: derûnî	interne, mental, spirituel	inner, internal, mental
derviş : derwêş, *far*.: derwîş	derviche	dervish
derya : derya, zerya, *far*.: derya, *peh*.: deryap	mer	sea
destan : destan, dastan, *far*.: dastan, *peh*.: dastan	épopée, ballade	epic, ballad, tale
deste : deste, *far*.: deste, *peh*.: destek	banquet, gerbe, poignée	bunch, bouquet
destek : destek	appui, soutien	support, prop
destur : destûr, *far*.: destûr, *peh*.: destwer	permission	permission, leave
dev : dêw, *far*.: dîv, *peh*.: dêw	1) ogre, démon, 2) géant	1)ogre, demon, devil, 2) giant, gigantic
diba : dîba, *far*.: dîba, *peh*.: dêpak	1) brocart, 2) peau et visage de velours	1) silk tissue, 2) velvet skin and complexion
diğer : din (di, dî, dîtir, dîke), *far*.: dîger, diger, *peh*.: dîtîker	autre, autrui	other, the other
dilbaz : dilbaz, *far*.: dilbaz	charmant, séducteur, beau parleur	eloquent, flirt, flirtatious
dilber : dilber, *far*.: dilber	beauté, qui ravit le cœur	beautiful woman, heart-captivating
dirgen : dirgan (= şene, melhêb)	fourche	pitchfork
divan : dîwan, *far*.: dîvan, *peh*.: dêwan	1) conseil d'Etat, 2) cour d'un roi ou seigneur	1) Council of State, 2) Court of a king or lord
divane : dîwane, dîn, *far*.: dîwane, *peh*.: dêwaneg	fou, dérangé	foolish, crazy, insane
divanhane : dîwanxane, *far*.: dîwanxane	cour, salon de réception	court, large hall of reception
dizdar : dizdar, *far*.: dijdar	commandant d'une forteresse	constable, warden of a castle
dolab : dolab, *far*.: dolab	armoire	cupboard, wardrobe
domalan : dobelan, *lat*.: tuber melanosporum	truffe	truffle
dost : dost, *far*.: dost, *peh*.: dost	1) ami(e), 2) amant, maîtresse	1) friend, 2) lover, mistress
dostane : dostane	amicalement	friendly
dubara : dubare, *far*.: dubare	bis, une seconde fois	twice
duçar : duçar (duçar bûn), *far*.: duçar	(être) sujet à, (être) affligé de	subject (to), afflicted (with)
dudu : tûtî (papaxan), *far*.: tûtî	perroquet	parrot
duman : dûman, dû, *far*.: dûman	fumée	smoke, fumes
dut : tû, tût, *far*.: dûd, *peh*.: dûd	mûr	mulberry
duvar : dîwar, *far*.: dîvar, *peh*.: dêwar	mur	wall
dügah : dugah, *far*.: dugah	nom d'un makam	one of the oldest compound makams
düğme : dugme, *far*.: tukme, dukme	bouton	button
dümdar : dumdar, *far*.: dumdar	arrière-garde	rear guard
dürbün : dûrbîn, dûrebîn, *far*.: dûrbîn	jumelles, téléscope	fieldglass, telescope

E

ebru : brû, brî, birih, birhî, bireh, *far*.: ebrû, *peh*.: brûg, brûy	sourcil	eyebrow
efsane : efsane, *far*.: efsane, *peh*.: efsan	légende, mythe	legend, myth
efsanevî : efsaneyî, *far*.: efsane'î	légendaire, mythique	legendary, mythic
ejder : ejder, ejdiha, *far*.: ejder ejdeha, *peh*.: azidehag, *part*.: ejdehag	dragon	dragon
encam : encam, *far*.: encam, *part*.: hencam, *peh*.: hencam	résultat, conclusion	result, conclusion
encümen : encumen, *far*.: encumen, *peh*.: henzemen	conseil, comité	council, committee
endam : endam, *far*.: endam, *part*.: endam	corps, stature, forme	shape, stature, body
endaze : endaze, *far*.: endaze, *peh*.: hendaz	mesure, proportion	measure, proportion
endişe : endîşe, *far*.: endîşe	inquiétude, souci	anxiety, worry
erguvan : erxşewan, *far*.: erxşewan	poupre	purple
erişte : rişte, rijde, *far*.: rişte, *peh*.: rêşte	vermicelle	vermicelli, noodles
erk : erk, *sans*.: urk	travail, labeur	work, labor
ezber : ezber, ji ber, *far*.: ezber	par cœur	by heart

F

fent : fend, *far*.: fend	ruse, feinte, duperie	trick, ruse, feint
ferman : ferman, *far*.: ferman, *peh*.: freman	édit impérial, firman, ordre	imperial edict, firman, order
feryat : feryad, *far*.: feryad, *peh*.: freyat	cri, appel au sécours, complainte	cry, cry for help, complaint
fıstık : fistiq, fısteq, piste, *far*.: piste	pistache	pistachio
figan : fiẍan, fîẍan, *far*.: fiẍan, efẍan	cri de détresse, lamentation	cry of distress, lamentation
fihrist : fihrist, pêrist, *far*.: fihrist	indexe	index
fincan : fîncan, *far*.: fincan, pengan	tasse en porcelaine à thé ou café	coffee or tea cup
firuze : fîroze, pîroze, pîrozank, *far*.: fîrûze, *peh*.: pîrozek	turquoise	turquoise
fişek : fîşek, fîşeng, *far*.: fişeng	cartouche	cartridge
fişekhane : fîşengxane, fîşekxane (fabrîkeya fîşengan), *far*.: fişengxane		

KURMANCÎ

MAGAZINE LINGUISTIQUE KURDE

106, rue La Fayette, 75010 Paris - France

www.fikp.org

Directeur de la publication : **Reşo ZÎLAN**
Réalisation : **S. ILITCH & M. HASSAN**